Nêrîna li Nêrevanan li Haringeyê

Nêrevanên ku bêpere dixebitin - Ihtiyacên we girîng in

Gelo ez nêrevan im?

Nêrevan, mirovekî ku li xizmek xwe, mêr an jina xwe, hevalek an cînarek xwe yê ku xwedî seqetiyek an nexweşiyekê ye, dinêre an destekê dide wan e, ji ber ku ev kesên hanê di mal de, bê alîkarî, nikarin xwe îdare bikin. Nêrevan van karan bêpere dike.

Nêrevan ji derdor û civakên cûrbecûr derdikevin. Dibe ku nêrevan ciwan an pîr û kal, mêr an jin, xwedî karek an bêkar bin.

Hun ne tenê ne

Heke ku hun nêrevanek in, hun tenê nînin. Lêkolîneke ku vê dawiyê Princess Royal Trust ji bo nêrevanan çêkiribû da nîşan ku aniha di nav Înglîstanê (Qraliyeta Yekbûyî) de 7 mîlyon nêrevan hene. Hejmartina Nifûsê ya sala 2001'ê texmîn dike ku li Haringeyê texrîben 16,000 nêrevan hene.

Xwe wek Nêrevanekê Qeyd bikin

Wek parçeke lixwegirtina Haringeyê ya naskirin û destekkirina nêrevanan, hun dikarin xwe wek nêrevanekê bi Xizmetên Sosyalê re qeyd bikin. Ev tê vê wateyê:

Em ê bi rêkûpêkî ji we pirs bikin ka nêrînên we çi ne.
Hun dikarin bêrandevû beşdarî civin/seansan bibin ku hun nêrevanên din nas bikin, agahî û şîretê bigirin, ji aktîvîteyên kêmbiha û bêhndayînên demkurt faydê bibînin, dert û nazên xwe bikin, û firsetên hîndekariyê yên wek livîn û serîpêrederanîn, xwedîotorîtebûyîn, îdareya stresê bi dest bixin.

Em ê qopyeke pirtûka destan ya nêrevanan bidin we. Di nav vê pirtûkê de, bi berfirehî agahî hene di derbarî xizmet û desteka ku di nav navçeyê de tên dayîn ji bo nêrevanan û mirovên ku nêrevan li wan dinêrin.

Mafê we heye ku hun ji bo xwe nirxandineke nêrevanê bidin kirin

Heke ku hun bi rêkûpêkî û êpî zêde li mirovekê dinêrin, hun dikarin daxwaza nirxdineke ihtiyacên xwe bikin û dema ku hewce bike, sererast ji bo xwe xizmet bidin temînkirin.

Qanûna nû ya Nêrevanan

Qanûna Nêrevanan (Firsetên Wekhev) 2004, dixwaze ku zêdetir bijartek/tercîh û firsetên baştir bide nêrevanan. Divê ku Belediyê çi ji destê wê tê bike, ji bo ku ew bide garantîkirin ku nêrevan xwedî heman firsetan in, wek mirovên ku li ser milê wan tu berpirsiyariya lênêrînê tunin, di warî- xebat, hîndekarîdîtin û perwedebûyîn, xwedîbûyina dema serbest/vala de.

Hun çawa dikarin ji bo kirina nirxandinekê daxwazî bikin

Heke ku hun dixwazin ihtiyacên we bên nirxandin, vê yekê, ji xebatkerekê Xizmetên Sosyalê re an ji kordînatorê lênêrînê ya mirovê ku hun lê dinêrin re bêjin. Ew ê ji bo we nirxandinekê eyar bikin. Heke ku têkiliya we bi tu keseke ji Xizmetên Sihetê an Sosyalê re tune, bi Ekîba Desteka Nêrevanan (Carers Support Team) re li ser 020 8489 3967 bikevin têkiliyê û ew ê, we, hewaleyî ekîba eleqedar bikin.

Ji bo zêdetir agahî an şîretê, ji kerema xwe bi li vir re bikevin têkiliyê:

Haringey Social Services
40 Cumberland Road
London N22 7SG

Tel: 020 8489 3967
Faks: 020 8489 3032
Email: carerssupportteam@haringey.gov.uk

Grubên destekê yên heremî

Li Haringeyê, gelek organîzasyonên ku destek û şîretê didin hene û hun dikarin sererast xwe bighînin wan:

Navenda Nêrevanên Haringeyê (Haringey Carers Centre)
Tel: 020 8489 8980
Agahî, şîret û destek ji bo nêrevanan.

Xizmeta Destekê ji bo Nêrevanên Reş û yên ji Hindikayiyên Etnîk
(Black and Minority Ethnic Carers Support Service)
Tel: 020 8808 5510
Ew, li Haringeyê, xizmeteke nêrevaniyê temîn dike ji bo bicîhanîna ihtiyacên nêrevanên reş û yên ji hindikayiyên etnîk.

Komela Destekê ji bo Nêrevanên Mirovên Xwedî Nexweşiyên Hişê
(Mental Health Carers Support Association)
Tel: 020 8885 2006
Ew destekê dide nêrevanên ku li mirovên xwedî nexweşiyên hişê dinêrin.

Nexweşnêrên Admiral (Admiral Nurses)
Tel: 020 8442 6149
Destekê dide nêrevanên ku li mirovên xwediyê nexweşiyên hişê dinêrin.

Komela Alzheimer (Alzheimer's Society)
Tel: 020 8341 2045
Destekê dide nirêvanên ku li mirovên xwedî nexweşiya Alzheimer/hişê dinêrin.

Gruba Destekê ya Nêrevanên Asyayî (Asian Carers Support Group)
Tel: 020 8365 7708
Destekê dide nêrevanên ku li her awa mirovên Asyayî dinêrin.

Stepping Out, Mencap
Tel: 020 8365 0251
Destekê dide nêrevanên ku li mirovên xwedî nexweşiyên hînbûnê dinêrin.

Projeya Nêrevanên Ciwan ya Haringeyê (Haringey Young Carers Project)
Tel: 020 8348 4660
Destekê dide nêrevanên bin 18 salî û malbatên wan.

Ji kerema xwe ji me re bêjin heke ku hun qopyeke vê lîfletê bi yek ji van formatên jêrin dixwazin, û vê formê bişînin edresa li jêr. Pûl hewce nake.

☐ Bi Tîpên Gir ☐ Ser Dîsketê ☐ Ser Qasetekê Guhdarîkirinê ☐ Bi Tîpên Hilpişandî

Nav:

Edres

Ji kerema xwe vegerînin li vir: Haringey Council, Translation and Interpreting Services
FREEPOST LON18649, London N22 8BR